şopdara rastiyê ye
Ronahî
www.ronahi.net/ku/ Hejmar: 492 19- Mijdar - 2018 Rojnameya Siyasî û Çandî

# YPG'ê dewreyeke din bi dawî kir



**Xebatên perwerdeyê yên Yekîneyên Parastina Gel YPG'ê bê navber didomin. Di her dewreyekê di bi dehan şervan tên perwerdekirin. Li Akademiya Şehîd Xebat a li bajarê Hesekê dewreyeke perwerdeyê ya din dawî bû.**

Li Akademiya Şehîd Xebat a Yekîneyên Parastina Gel a li bajarê Hesekê dewreyeke perwerdeyê dawî bû. Dewreya perwerdeyê bi navê Şehîd Ezîz 50 rojan dewam kir. Bi dehan şervan tev li perwerdeyê bibûn. Di dewreyên de waneyên fikrî û leşkerî hatin dîtin.
Bi armanca bidawîbûna dewreyê merasîmek hate lidarxistin. Bi dehan şervan û fermandarên YPG'ê û malbatên şehîdan beşdarî merasîmê bûn. Di merasîmê de yek ji fermendarên YPG'ê Nûman Amûdê axivî û derçûna şervanan pîroz kir û got: "Em di wê baweriyê de ne ku hûnê xeta şehîdên ku ji bo welat canê xwe feda kirine bişopînin. Hûn dizanin artêşa Tirk a dagirker di vê demê dawî de Kobanê û Girê Spî topbaran kir. Divê li hember her êrîşekî li dijî herêmê em amade bin. Em soz didin bajarê me Efrînê em ê wê ji dagirkeriya Tirk û çeteyên girêdayî wê rizgar bikin."
Piştî merasîmê şervanên ku ji dewreyê derketine sond xwarin...*ANHA*

## Ji Amedê çend dîmenên payîzê

Payîz bi xemla xwe Amedê dixemilîne.





Di vê heyama payîzê de Sûrên dîrokî yên Amedê, Pira Deh Derî, Çemê Dîcleyê û Bexçeyên Hewselê bi rengên bedew xemilîne.

## Rêzeyên Hemleyên paqijî û çandina daran

Bîroya Jin a di Şaredariya Navçeya başûrê Hesekê, bi çavdêrî û alîkariya bîroya teknîk, beşê paqijî û jîngehê dest bi hemleyên paqijî û çandina daran kirine.

### JÎ BO TENDRUSTÎYA GEL HEMLEYA PAQÎJÎ GÎRÎNGE

Di çarçoveya hemleya paqijî li taxa Xiwêran de, ku ev hemle ji hêla gelê wê ve rastî eleqeyek mezin hat û ew jî beşdarî paqijiya texê bûn. Ev hemleya di çarçoveya rêzhemleyên şaredariyê yên xizmetguzariyê têne kirin, da ku ekolojiyek tendrustî ji hemwelatiyan re pêşkêş bikin. Her wiha bi vê wesîleyê bajêr paqij û xweşik dibe, di heman demê de wiha parstina dar û jîkahî jî tê kirin; dê mîna van hemleyan berdewam bike. Gelek taxên başûrê Hesekê; da ku her tim keskahî hebe û bimîne, her wihsa ji bo jiyanek bi tendrûstî û ekolojîyek bi hemû cûreyan paqij û parstî bin mîna van hemleyên paqijî û çandina daran gelek girîngin.
Bîroya JIn û Tenîk bi van gotinan tekez kirin ku pêwîste ku em bi van meleyên hişyar û êandî rabin da ku gel girîngiya paqijî û parastina jîngehê bizanibe û pêşbikeve. Jibo wê jî emê her mîna van hemleyan de li hemû herêmê berdewam bikin." *Ronahî/Hesekê*





## Koalîsyonê û QSD'ê êrîşên Tirkiyê gotûbêj kirin




Şandeyeke Koalîsyona Navnetewî û fermandarên Hêzên Sûriya Demokratîk (QSD) li gundê Til Hebeş ê navçeya Amûdê ya herêma Cizîrê li hev civiyan. Di civînê de rewşa sînor yê di navbera Rojava û Bakurê Kurdistanê de û êrîşên dewleta Tirk hatin nîqaş kirin. Fermandarekî Koalîsyonê diyar kir ku ji bo rê li ber şer bigirin ew ê li ser sînor çavdariyê êrîşên dewleta Tirk bikin. ***R-2***

## Li Efrînê tasfiyekirina çeteyan destpê kir



Artêşa Tirk a dagirker dest bi tasfiyekirina hin komên xwe yên çete yên li Efrînê kir. Hate ragihandin tîmên taybet ên vê hefteyê ji Tirkiyê sewqî Efrînê hatin kirin, li dijî hin komên çete yên di nava çeteyên Ehrar Şarqiye û Hûrras El Dîn de ne, dest bi operasyonê kirine.***R-2***

## Em amade ne bersiva êrîşan bidin



Şêxê êla El-Şemer a Iraqê Şêx Ebdulezîz El-Cerba piştî êrîşên DAIŞ'ê li dijî Iraqê, ku niha li Bakurê Sûriyê dimîne êrîşên dewleta Tirk ya dagirker yên li ser Bakurê Sûriyê şermezar kir û diyar kir ku ew amade ne li gel gelên herêmê li dijî êrîşan bisekinin. ***R-4***

şopdara rastiyê ye
Ronahî
www.ronahi.net/ku/ Hejmar : 492 19- Mijdar - 2018 Rojnameya Siyasî û Çandî

# BI DOZERAN DARÊN ZEYTÛNAN RADIKIN

### DAGIRKER KIRYARÊN HOVANE DIDOMÎNIN

Talan, kuştin, revandin, êşkence, dizî, guhertina demografîk û bi her awayî qirkirin li Efrînê dewam dike. Dewleta Tirk û çeteyên xwe li ber çavên hemû cîhanê van sûcên mirovahiyê dikin. Dewleta Tirk a dagirker û çeteyên xwe li Efrînê li cem hemû kiryarên xwe yên dij mirovî xwezaya Efrînê jî tune dikin. Dagirker darên zeytûnan jê dikin û bi dozeran ji binîve radikin.

### HER TIŞTÎ TUNE Û TALAN DIKIN

Dewleta Tirk a dagirker di heman demê de êrîşî çavkaniyên debarê yên welatiyan jî dike û xwezaya herêmê tune dike. Hat ragihandin ku li gundê Maseka ya navçeya Raco dagirker darên zeytûnan talan dikin. Darên zeytûnan yên ku bi deh salan berê welatiyan bi ked û cefayeke mezin çandine dagirker bi dozeran ji binîve radikin. ***R-5***



## Em ê piştgiriyê bidin QSD`ê



Bi dehan rûspiyên eşîrên Qamişlo tev li hevdîtina ku di 17'ê mehê de li Qamişlo hate lidarxistin, bûn. Rûspiyê êla Şerabiyan ê bi navê Sbit El-Cewher û Rûspiyê êla El-Hebîb Îsam El-Hebîb nerazîbûn nîşanî êrîşên artêşa Tirk yên li ser Bakurê Sûriyê dan û diyar kirin ku ew ê li hember êrîşan piştgiriya QSD'ê bikin. ***R-5***

## Bi sedan kesan ji dagirkeriyê re gotin, Na!




Nerazîbûnên li dijî êrîşên dewleta Tirk a dagirker yên li ser Bakurê Sûriyê û tecrîdkirina Rêber Ocalan berdewam dikin. Bi vê armancê bi sedan welatiyên navçeya Eyn Îsayê meşek lidarxistin û êrîş û tecrîd şermezar kirin. Di meşê de hat gotin ku wê li hember êrîşan heta dawiyê ew ê li ber xwe bidin. ***R-2***

## Jinên Kobanê name ji CPT re şandin



Bi boneya 25'ê Mijdarê Roja Tekoşîna Li Dijî Tundiya li ser Jinan, jinên Kobanê li gundê Elperlûr yê ku Rêber Ocalan di sala 1979'an lê mabû semînerek lidarxistin. Di semînerê de bi dehan jin amade bûn. Piştî semînerê jinan ji bo tecrîda li ser Rêber Ocalan bi dawî bibe ji CPT'yê re nameyek şandin. ***R-3***

## Divê têkoşîna sosyalîzmê bê mezinkirin



Endamê Komîteya Rêveber ya PKK'ê Nûreddîn Demîrtaş, bi wesîleya salvegera 40. a damezrandina PKK'ê diyar kir ku, PKK bûye ala sosyalîzmê. Demîrtaş diyar kir PKK ji bo Kurdan, Tirkan, Suryaniyan, Ereban, Çerkesan û hemû gel û baweriyên li ser xaka qedîm a Mezopotamyayê ne, bûye tevgera azadî û demokrasiyê. Demîrtaş, li dijî faşîzmê banga mezinkirina têkoşîna sosyalîzmê kir. ***R-4***

## Tirkiyê sozên ku dabû bi cih neanî

Peymana li ser Îdlibê ya di navbera Tirkiyê û Rûsyayê de ya ku qet pêk nehat ber bi dawiyê ve diçe. Kanala Navendî ya Bargeha Himêmîm a Rûsyayê diyar kir ku Enqereyê heta niha sozên xwe li hemberî tinekirina radîkalan li Idlibê pêk neaniye û ev yek bandoreke neyînî li parastina ewlehiya herêmê dike. ***R-2***




## Li Kobanê navendeke HPC`ê hat vekirin

Xebatên xwe parastinê li Rojava dewam dikin. Di vê çarçoveyê de li bajaroka Til Xezalê ya başûrê Kobanê navendeke Hêzên Parastina Civakî HPC'ê bi merasîmekê hat vekirin. Bi dehan welatiyên bajarok û endamên Rêveberiya Xweser a Kobanê tevlî merasîma vekirinê bûn. Di merasîma vekirina navendê de li ser girîngiya parastinê û HPC'ê axaftin hatin kirin. ***R-2***

## Li Reqayê çalakiyên 25'ê Mijdarê tên lidarxistin

Bi wesîleya Roja Tekoşîna li Dijî Şideta li ser Jinan ya Cîhanê li Reqayê rêze çalakî tên lidarxistin. Bi vê armancê semînereke ji jinan re hat dayîn. Di semînerê de li ser şêwazên tundiya li ser jinan û têkoşîna li dijî tundiyê hat nîqaş kirin. Her wiha derbarê rojê de jinan belavok belav kirin. ***R-3***

## Tecrîd wê bi têkoşînê bi dawî bibe



Siyasetmedarên Kurd li Amedê ji bo piştgiriyê bidin çalakiya greva birçîbûnê ya Hevseroka KCD'ê Leyla Guven ku ji bo dawî li tecrîda li Îmraliyê bê dest bi greva birçîbûnê kiriye, diyar kirin ku hêviya gelên Rojhilata Navîn Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan e û gotin: "Tecrîd wê bi têkoşînê bi dawî bibe." ***R-5***

# Koalîsyonê û QSD'ê êrîşên Tirkiyê gotûbêj kirin

**Şandeyeke Koalîsyona Navnetewî û fermandarên Hêzên Sûriya Demokratîk (QSD) li gundê Til Hebeş ê rojavayê navçeya Amûdê ya herêma Cizîrê li hev civiyan. Di civînê de rewşa sînor yê di navbera Rojava û Bakurê Kurdistanê de û êrîşên dewleta Tirk hatin nîqaş kirin. Fermandarekî Koalîsyonê diyar kir ku ji bo rê li ber şer bigirin ew ê li ser sînor çavdariyê êrîşên dewleta Tirk bikin.**



Şandeya Koalîsyona Navnetewî diyar kir ku sedema hebûna wan li herêmên sînor ew e ku çavdêriya êrîşên dewlet Tirk li dijî herêmên Bakurê Sûriyê bikin û rê li pêşiya derketina şer bigirin.
Şandeya Koalîsyona Navnetewî bi fermandarên Hêzên Sûriya Demokratîk (QSD) li gundê Til Hebeş ê rojavayê navçeya Amûdê ya herêma Cizîrê civiya. Her du aliyan rewşa dawî li ser sînorê di navbera Rojava û Bakurê Kurdistanê de û êrîşên dewleta Tirk yên li dijî welatiyên Bakurê Sûriyê de gotûbêj kirin.
Di nîqaşan de behsa rêbazên rêgirtin li pêşiya derketina şer hate kirin.
Di dawiya nîqaşan de fermandarekî Hêzên Koalîsyona Navnetewî ragihand ku çeteyên DAIŞ'ê hê jî li rojhilatê Firatê tune nebûne û pêngava li dijî çeteyan bi hevkariya QSD'ê hê jî berdewam e û destnîşan kir ku QSD wê aramiya herêmê biparêze.
Fermandarê Koalîsyonê jî da zanîn ku sedema hebûna wan li deverên sînor ew e ku çavdêriya êrîşên Tirkiyê li dijî herêmên Bakurê Sûriyê bikin û rêbazên çareseriyê bibînin ku rê li pêşiya şer ku gefên li aramiya herêmê bigirin.

## Tirkiyê sozên ku dabû bi cih neanî

Bargeha Hemîmîm a Rûsyayê hişyarî da ku Enqerayê nikare sozên xwe li bermberî tinekirina "Radîkalan" li Idlibê ku aramî û ewlehiya wê tevlîhev dikin, pêk bîne. Her wiha li herêma bêçek binpêkirin didome.
Kanala navendî ya bargeha Hemîmîm a leşkerî ya Rûsyayê diyar kir, Enqereyê heta niha sozên xwe li hemaberî tinekirina radîkalan li Idlibê ya Sûriyê pêk neaniye û ev yek bandoriyeke neyînî li parastina ewlehiya herêmê dike.
Di vê çarçoveyê de Navenda Çavdêriyê ya mafên mirovan a Sûriyê diyar kir, şeva Şemî – Yekşemê li derdora El-Sermaniyê ya Sehil El-Xab a gundewarên bakur rojavayî Hemayê topbaran di navbera komên çeteyên Tirkiyê û hêzên rêjîma Sûriyê de pêk hatiye.



## Li Efrînê tasfiyekirina çeteyan destpê kir



Hate ragihandin, dewleta Tirk ji bo tasfiyekirina hin komên xwe yên çete yên li Efrînê dest bi operasyonê kiriye û di navbera çeteyan û leşkeran de şer derketiye.
Artêşa Tirk a dagirker dest bi tasfiyekirina hin komên xwe yên çete yên li Efrînê kir. Li gorî agahiyên ku ANF'ê, tîmên taybet ên vê hefteyê ji Tirkiyê sewqî Efrînê hatin kirin, li dijî hin komên çete yên di nava çeteyên Ehrar Şarqiye û Hûrras El Dîn de ne, dest bi operasyonê kirine.
Çavkaniyên herêmî diyar kirin, komên çete yên ji aliyê dewleta Tirk ve hatine wezîfedarkirin ji ji 17'ê mijdarê bi şev û vir ve rêyên bingehîn ên li Efrînê girtine û dest bi operasyonê kirine.
Li gorî agahiyên ji herêmê hatin girtin, li taxa Eşrefiyê şer derketiye û di şer de çekên doçka, tank û çekên sivik hatine bikaranîn. Tê gotin, li ser bajêr balafirên keşfê bê navber difirin û tîmên taybet ên Tirk sekvan li ser banê gelek malên li navenda bajêr bi cih kirine.
Çavkaniyan gotin, şer dewam dike û gelê Efrînê reviyane nava gundan. Tê gotin, ketin û derketina navenda bajêr hatiye qedexekirin.

## Bi sedan kesan ji dagirkeriyê re gotin, Na!

Bi sedan welatiyên navçeya Eyn Îsa û welatiyên kampê de li dijî êrîşên artêşa tirk a dagirker li ser Bakurê Sûriyê û tecrîdkirina Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan meşek lidar xistin.
Bi sedan ciwanên navçey Eyn Îsa, mamosteyên navçeyê û gundewarên wê, ciwanên Kampa Eyn Îsa, endam û rêveberên komîteyan û bi dehan welatiyên navçeyê û gundewarên wê bi dirûşmeya"Li dijî êrîşên dewleta Tirk a dagirker serî hildin" û bi armanca şermezarkirina tecrîdkirina Rêberê Gelê Kurd Abdulah Ocalan meşek li dar xistin.
Meş ji ber Navenda Tevgera Ciwanên Şoreşger ên Sûriyê ya navçeya Eyn Îsayê dest pê kir.
Di meşê de ala YPJ/YPG/QSD, wêneyên Rêberê Gelê Kurd Abdulah Ocalan û pankartên bi nivîsên "Êrîşên li ser Bakurê Sûriyê îrade û hêza me zêdettir dike, li dijî dagirkeriyê serî hildin û ji bo azadi-



ya Rêber Ocalan serî hildin" hatin rakirin.
Di meşê de bi navê Ciwanên Şoreşger ên Sûriyê û bi navê malbatên şehîdan axaftin hatin kirin. Di axaftinan de hate gotin ku gelên Bakur û Rojhilatê Sûriyê tu carî serî li ber êrîşên dewleta tirk a dagirker natewînin û wê heta dawiyê li ber xwe bidin.
Kesnê ku axivîn banga rakirina tecrîda li ser Rêberê Gelê Kurd Abdulah Ocalan û serbest berdana wî hate kirin.

## Li Kobanê navendeke HPC`ê hat vekirin

Di çarçoveya parastina rewa de, welatiyên Bakurê Sûriyê roj bi roj hêza xwe ya civakî ya bi navê HPC`ê xurtir dikin. Li ser vê bingehê, HPC`ê navendeke xwe li bajaroka Til Xezal ê başûrê Kobanê vekir.
Navenda HPC`ê bi navê Şehîd Sebrî bi merasîmekê hate vekirin. Bi dehan welatiyên bajarok û şandeyek ji Rêveberiya Xweser a Kobanê tevlî merasîma vekirinê bûn.
Hevserokê Şaredariya Kobanê Faris Etî di merasîmê de axivî û diyar kir ku ev navend bersiva êrîşên li ser Kobanê ye û cihê parastinê ye û got: "Vekirina navendeke bi vî rengî xwedî derketina li nirxên şehîdan e, em bi parastina xwe bersiva her êrîşan didin."
Endamê Rêveberiya Meclisa bajaroka Til Xezal Cemal Elî bi xêr hatina mêvanan kir û got: "Armanca me ji vekirina navendê ku her kes xwedî li parastina warê xwe derkevê û axa xwe biparêzin."
Piştî axaftinan, deriyê navendê ji aliyê dayîka şehîd Sebrî, Helîm Şêxo ve hat vekirin… *ANHA*








# Komîna Şems ya Govendê hat vekirin

***Tevgera Çand û Hunera Demokratîk di 17'ê Mijdarê de bi şahiyekê navenda Komîna Şems a govendan vekir. Bi sedan şêniyên Kantona Hesekê, dildariyên şano û muzîkê, hejmarek ji hunermend û komên hunerî ji cuda bajar û deverên Herêma Cizîrê tevî koma govendê ya Minbicê tev li şahiyê bûn.***



Tevgera Çand û Hunera Demokratîk a navçeya Dirbesiyê roja 17'ê mehê bi şahiyekê navenda Komîna Şems a govendê vekir.
Tevgera Çand û Hunera Demokratîk bi şahiyekê navenda Komîna Şems a govendan vekir.
Şahî li navenda Çand û Hunerê ya Dirbesiyê hate organîzekirin.
Bi sedan şêniyên Kantona Hesekê, dildariyên şano û muzîkê, hejmarek ji hunermend û komên hunerî ji cuda bajar û deverên Herêma Cizîrê tevî koma govendê ya Minbicê tev li şahiyê bûn.
Şahî bi axaftina endama rêveber a Komîna Şems Dîma Elî destpê kir. Dîma avakirina komînê li tevahiya gelê Sûriyê pîroz kir û got: "Bi rêya govendê her pêkhateyek çanda xwe nîşan didin."
Paşê koma Komîna Şems govendên Kurdî pêşkêş kirin û Koma Tolhildan a girêdayî navenda Çand û Hunerê ya bajarê Hesekê şanoyek têkildarî belavkirina îdia û derewan pêşkêş kir.
Ji aliyê din ve Koma Minbicê û Ukab berhemên xwe yên girêdayî pêkhateya Ereb pêşkêş kirin. Her wiha her du komên stranê Zîlan û Kîkan stran pêşkêş kirin.
Di dawiya şahiyê de deriyê Komîngeha Şems ji aliyê dayîkên şehîdan ve hat vekirin…*ANHA*

## Li Silêmaniyê bazara mûzîkê

Bazara muzîkê yan jî bazara hunermendan, yek ji xweşikbûnên bajarê Silêmaniyê ye. Ne tenê alavên muzîkê yên cûr bi cûr lê hene, di heman demê de bûye wekî dîwanxaneyek ji bo mêvanan.
Li bajarê Silêmanî bazara Mecîd Beg ku dikeve ser rêya Pîremêrd nêzîkî 10-15 dikanên ku alavên muzîkê yên cûr bi cûr lê tên firotin hene.
Dema mirov di nava rêya Pîremêrd de diçe, dikanên firotina amûrên muzîkê balê dikşînin ser xwe.
Dema ku mirov dikeve hundirê van dikanan, mirov li rastî bi dehan cûre amûrên xweşik yên muzîkê tê. Ev amûr bi têkelbûna dengên hunermendên wekî Mihemedê Mamlê, Mezherî Xaliqî, Ednan



Kerîm û gelek hunermendên din ku ji nava dikanan bilind dibin rengekî cûda didin nava vê bazarê.
Ev bazar ne tenê ji ber amûrên mûzîkê bi navûdeng bûye, ji ber ku xwediyên van dikanan ne tenê firoşkarin, di heman demê de her yek ji wan mûzîsyen in û bi awayekî profesyonel li van amûrên mezîkê dixin. Ji ber wê jî gelek caran jêre tê gotin bazara hunermendan.
Arî Fewzî Asfî, yek ji xwediyê dikanên amûrên mûzîkê ye. Arî diyar kir ku wî li gel birayê xwe yekem car dikana amûrên muzîkê li vê bazarê vekiriye. Herwiha Arî got, li vê derê ne tenê Kurd serdana wan dikin, gelek xelkên biyanî wek Ereb, Tirk, Fars û Îngiliz tên û di nava vê bazarê digerin.
Arî diyar kir, ew kesên biyanî ku tên nava bazarê digerin hemû kesên mûzîsyenin, tên demek li van amûrên muzîkê dixin û demekî xweş derbaz dikin.
Ev bazara muzîkê mirov dikare wekî yek ji cihên xweşik yên bajarê Silêmanî bi nav bike, ji ber ku hertim di nava vê bazarê de huner û hunermend hene…
*ROJNEWS*

## Pêşangeha Gerok a Pirtûkan li Hesekê ye

Pêşangeha gerok a pirtûkan li bajarê Hesekê hate vekirin.
Pêşangeha Gerok a pirtûkan ji aliyê Desteya Çand û Hûner a bajarê Hesekê ve hatiye organîzekirin. Pêşengeh wê 3 rojan li herêma Cizîrê dewam bike. Hevserokê Meclisa Rêveber a Cizîrê Ebdulkerîm Sarûxan, hevserokên kantona Hesekê Ebdulxenî Oso û Semer Ebdulah beşdarî vekirina pêşengehê bûn.
Di vekirina pêşengehê de Hevseroka Desteya Çand û Hûner a kantona Hesekê Efaf Heskî axivî û destnîşan kir ku bi rêya xwendinê mirov dikarin sûd ji tecrûbeyan werbigirin.
Efaf diyar kir ku divê di her malekê de pirûkxaneyek hebe da ku zarokên wê malê li ser çanda xwendinê mezin bibin û afrîneriya xwe pêş bixînin.
Hevserokê Meclisa Rêveber a Cizîrê diyar kir ku pêşangehên bi vî awayî û pirtûk dikarin dîroka gelên herêmê ku ji aliyê siysetên desthilatdaran ve ku li ser gelan pêk tanîn windabûne jinûve vejînin.
Sarûxan kêfxweşiya xwe bi pêşangehê diyar kir û da zanîn ku mirov dikarin bi rêya pirtûkan nifşên nû li ser berxwedana gelên herêmê ava bikin.
Sarûxan diyar kir ku divê hemû nîviskar û rewşenbîr li dijî komployên ku dixwazin destkeftiyên gelên herêmê, çand û dîroka wan binpêbikin, derbikevin.
Pêşangeha gerok a pirtûkan li gelek bajarên herêma Cizîrê hate vekirin û wê 3 rojan li bajarê Hesekê dewam bike…*ANHA*





## Di Mihrîcanê de rêzefîlm hatin pêşandan

Mîhrîcana Fîlman a Kobanê ya Navneteweyî didome. Di vê çaçroveyê de li Kobanê, Kampa Eyn Îsa û Serdemê rêzefîlm hatin pêşandan.
Mîhrîcana Fîlman a Kobanê ya Navneteweyî ku ji aliyê Komîna Fîlm a Rojava ve hatiye bi rêxistinkirin didome.
Çalakiyên Mîhrîcana Fîlman a Kobanê ya Navneteweyî 13'ê Midarê bi boneya salvegara 58'an a Komkujiya Amûdê ku di encamê de 283 zarok ku li Sînemaya Şehrazad ya li Amûdê şehîd bûne hatiye organîzekirin.
Di roja pêncemîn a mîhrîcanê de ku bi dehan kes û hezkiriyên sînameyê beşdar bibûn hejmarek kurtefîlmên mîna "Baskên avê, li împratoriyê rojek dijwar û Nîroj"hatin pêşandan.
Ji wan Paşê fîlmên kartonî wekî "Min gula xwe dît, bizina min a biçûk, zimal û malbatek hişt", her wiha belgefîlmek bi navê "5 sal piştî şer" hatin pêşandan…*ANHA*



### Çima dost ji me re pedivî ne

Derwêş M. FERHO

Di dawiya salên heftê de Kurd li Beljîka kêm bûn. Pirraniya wan di çarçeweya kar de ji Bakur koçberî vî welatê piçûk kiribûn. Ji xeynî 12 xwendekarên Başûrî ku ji Awusturya ji bo xwendinê hatibûn, biqasî tiliyên destekî penabarên siyasî ji Bakur hebûn. Haya wan çend kesan jî ji hev nebû. Yekem roja ku bi hev hesiyan sala 1978 bû. Sala ku Yekîtiya Karker û Xwendevanên Kurd li Beljîka, bingeha Enstituya Kurd li Bruksel, ava bû.
Civakek ku di wê demê de ji tirsa dewleta Turkiyê Kurdbûna xwe jî vedişart. Heta wê derecê ku beşdariya pîrozkirina şahiya Newrozê di 1979 de ji wan re gaveke 'xeter' bû. Dema di malên wan Kurdan de behsa avakirina komele yan pîrozkirina cejna Newrozê dihate kirin ew li awayê qutkirina axaftinê digeriyan û xwe didane aliyekî. Peywendiyên bi hevra weke Kurd kêm û 'bi zerer' bû. Bi Turkbûnê xwe di ewlekariyê de didîtin. Û di wê demê de li temamiya Kurdistan zor û zilma dewletên dagîrker bi hemû dijwariya xwe berdewam bû.
Civaka Beljîka jî li ser pirsgirêka Kurdistanê ne xwedî zanîneke kûr bû. Dema me behsa Kurd û Kurdistanê dikir wan deh caran dipirsîn ku bizanin Kurd çi ne û Kurdistan li ku ye. Bi vê rastiyê re weke çalakvanên Kurd peywîrek du alî dikete ser milê me. Li nav civaka xwe de ji bo Kurdbûna me û li ser pirsgirêka Kurdistan di nava civaka Beljîkî de ku ji du gelên sereke pêk tê xebateke kûr were meşandin. Bi hemû dijwarî û tehdîdên pirr alî ev xebat hat kirin. Cejna Newrozê li gor derfetên wê rojê lê bi serbilindî hate pîrozkirin. Serokê Senatoya Beljîka, Prof. Ward Leemans, beşdar bû û bi axaftina xwe ya giranbuha bixêrhatina beşdaran kir.
Xebat berdewam bû. Bi çalakiyên curbecûr, weşanên bi zimanên cuda, mûzîk û govendên Kurdistanî, beşdariya civînên bi sazî û dezgehên din re kar dibû. Di warê siyasî de jî xebateke bê anver û xurt hate birêvebirin.
Bi saya peywendiyan şandeya ji pênc parlementerên Vlaman (Bejîkî) pêkhatî çû Bakurê Kurdistan. Hugo Van Rompaey (CVP), Jef Sleeckx (SP), Willy Kuijpers (VU), Hugo Van Dienderen (Agalev), Tijl Declercq (Pax Christ), wek nûnerên partiyên xwe rewşa Kurdan li Bakur dît. Wan ji Stembolê dest bi hevdîtinên xwe bi Sakîne Cansiz, Musa Anter, Günay Aslan, Ismet Ateş, Tarik Ziya Ekinci, û çend kesên din re kir. Li Amedê û Batmanê bi Hatip Dicle û çend kesên din re, li Sêrtê bi Zubeyir Aydar û Ali Sevilgen re, li Cizîrê, Şirnexê, Nisêbînê bi nûnerên saziyên Kurdan re pêk anîn. Li Ankara bi Ismail Beşikçî, Ahmet Türk, Erdal Inönü û Suleyman Demirel re, rewş axaftin.
Zubeyir Aydar, serokê Rêxistina Mafên Merovan li Sêrtê û Hatip Dicle, serokê heman rêxistinê li Amedê, di van hevdîtinan de raporên derbareyê zor û zilma li herêmê di hember gel de, li ser xwezayê pêşkêşi şandeyê dikin.
Di vegera xwe de ev her pêc nûnêrên partiyên cuda xebateke darîçav û bi wate dikin. Li Parlementoya Beljîka, li dezgehên Ewropî û nûnertriyên cuda, çendîn car pirsgirêka Kurdistan dan munaqeşekirin. Bi rêya sefareta Turkiyê nerazîbûna xwe dan zanîn. Û di roja 5.1.1991 de civîna çapemeniyê di Senatoya Beljîka de li dar xistin. Sefareta Beljîka, mîna her car mihawele kir ku bide zanîn rapora wan da ye ne rast e û ew bi vê yekê alîkariya terorîzmê dikin. Lê xebat û durustbûna van parlementeran rûyê qirêj yê dewleta Turkiye her tim heşkere kir.
Tijl Declercq di sala 2003 de çû ser dilovaniya xwe. Lê her çar parlementerên din hê sax in û dostaniya bi Kurdan re berdewam e.

# Dev ji xwendinê bernadin

**Piştî ku dewleta Tirk û çeteyên xwe Efrîn dagirkirin bi hezaran xwendekar ji xwendina xwe bê par man. Niha KPC-D li Kampên Efrîn, Berxwedan û Serdem yên li herêma Şehbayê 14 hezar xwendekar perwerde dike. Tevî kêmderfetî û şertên zehmet jî di mal û dibistanên hilweşyayî de xwendina xwe didomînin.**

14 hezar xwendekarên Efrîn û Şehbayê xwendina xwe di mal û dibistanên ku hatibûn rûxandin de û bi awayekî demkî hatine sererastkirin, berdewam dikin.
Li Efrînê Komîteya Perwerdeya Civaka Demokratîk (KPC-D) di nîvê sala xwendinê ya 2017 – 2018’an de ji ber êrîşên artêşa Tirk a dagirker û çeteyên wê li ser herêmê, neçar ma ku hemû dibistanan bigire da ku xwendekaran biparêze.
Piştî ku şêniyên Efrînê neçar man ji malên xwe derkevin û li Şehbayê bi cih bûn, komîteyê 20’ê Çileyê careke din dest bi xwendinê kir û 1`ê Tebaxê bi dawî kir.
KPC-D`ê piştî ku amadekariyên sala xwendinê ya 2018-2019`an bi dawî kirin, 15`ê Îlonê li herêma Şehbayê deriyên 81 dibistansan bi her sê astên xwe (seretayî, navîn û amedayî) li xwendekarên Efrîn û Şehbayê vekirin.
Niha 64 dibistanên asta seretayî hene û 11 hezar û 728 xwendekar tê de dixwînin. 10 dibistanên asta navîn hene û 14 hezar û 17 xwendekar xwendina xwe di wan de dewam dikin. Her wiha 465 xwendekarên asta amadeyî di 7 dibistanan de dixwînin.
14 hezar û 15 xwendekar di her sê astên xwendinê de, di kampên Şehbayê (Efrîn, Berxwedan û Serdem) de dixwînin.
KPC-D`ê ji bo perwerdekirina wan 977 mamoste ji bo hemû dibistanan amade kirine.

## PERWERDEYA PIRZIMANÎ

Di dibistanan de xwendekar perwerdeyê li ser dersên bîrkarî, zanist, dîrok, erdnîgarî, fîziya, kîmya, çand û exlaq û muzîkê dibînin. Her wiha zanista civakî, jineolojî di asta amedayî de têne dayîn. Xwendekar zimanên Kurdî, Erebî, Îngilîzî û Fransî fêr dibin.
Pirtûk û pêwîstiyên perwerdeyê li 11 hezar û 728 xwendekarên asta navîn hatin belavkirin û heta niha belavkirina pêwîstiyên perwerdeyê li xwendekarên asta navîn û amadehî didome.
Her wiha komîteyê 50 isfinc, 200 refên rûniştinê, 375 hesîr û 200 betanî ji Kampa Berxwedan re peyde kirine.



## MAL KIRIN DIBISTAN

Di encama şerên ku li herêmê rû dane de, dibistanên herêma Şehbayê wêran bûne. Ji ber wê Komîteya Perwerdeya Civaka Demokratîk neçar ma hinek malan li şûna dibistanan diyar bike.
Komîteya xwendekaran li dibistanên navîn û amadehî li gorî pergala îdarî ku ji endamek rêveber û 2 endamên rêveber ên jin pêk tê, di her refekê de tê organîzekirin û çavdêriya xwendekar û fêrgehê dikin.
Têkildarî mijarê xwendekara bi navê Heyfa Haşim diyar kir dagirkeriya Tirk ji bo ku wan ji dibistanê qut bike hewl da dibistanên wan wêran bike û wiha got: “A herî girîng em fêr bibin. Cih ne girîng e. Eger di bin darekê de be jî em ê perwerdeya xwe bibînin. Em materyalên xwe li gorî rêgeza xwendina bi zimanê dayikê dibînin. Ji ber wê dagirkeriya Tirk nikare me qir bike.”
Şagirta bi navê Fayza El-Salim a 10 salî diyar kir ku di encama şer de ew ji Helebê koçberî Efrînê bûn û piştre Şehbayê. Ji ber wê heta niha di refa 2’yan de maye û wiha got: “Em waneyên zimanê Kurdî dibînin. Em niha fêrî tîp û peyvan dibin, her wiha em waneyên bîrkariyê jî dibînin. Em baş fêr dibin û mamosteyên me alîkariya me dikin û xwendinê ji me re hêsan dikin.”
Girêdayî heman mijarê Endama Rêveber a Komîteya Perwerdeya Civaka Demokratîk Şêrîn Silêman diyar kir armanca wan vegerandina xwendekaran ji xwendinê re ye da ku wan ji windabûnê û bandora şer dûr bixin…*ANHA*

# Civîna salane ya Şaredariyên Sîgir û Am Zobaş



Bi armanca nirxandina xebatê salekê taybet nirxandina projeyên şaredariyê yên sala 2018’dan Komîteya Şaredarî û Ekolojî li Kantona Hesekê civîna xweyî ya salê ji hemû endamên ku di şaredariya Sîgir û Am Şopaz de dixebitin, ku ev herdû girêdayî Şaredariya Dirbêsiyê li Meclisa Navçeya Dirbêsiyê hate li darxistin.
Hevserokên Komîteya Şaredarî û Ekolojî û Şaredariya Dirbêsiyê, her wiha berpirsê komîteya jîngehê ya Kantonê civîn birêve birin. Di heman demê de hemû karmendinê herdû şaredariyan jî berşdarî civînê bûn.
Di civînê de Hevserokê Komîteya Şaredarî û Ekolojî Raziya Ibrahîm da zanîn ku armanca li darxistina vê civînê, di çarçoveya rêze civînên ku komîteya Şaredarî û ekolojî ya Kantona Hesekê bi rêxistin kirine ewe, ku nirxandina xebat û projeyên Şaredariyê yên sala 2018’an, her wiha çawaniya têkîliyên Şaredarî û Mecilsên navçeyan bi hevre û xurtkirina wan; ev civîn hate li darxistin.
Raziya wiha bi dawî kir ku ya girîng em ser pirsgirêkên vê salê bisekirin û di sla nûde van pirsgirêkan derbas bikin.”
Di civînê de piranî ser mîzaniya Şaredariyê û pêwîstî û peydakirina alavên xizmetguzariyê ji Şardariyê re hate nîqaşkirin.
*Ronahî/Dirbêsiyê*

# Dewreyên teknîk li şaredariyên Herêma Cizîrê hate dayîn


Endamên Beşa teknîk yên Şaredariya kantona Hesekê û Qamişlo dewreyên perwerdê,li ser xebatê teknîk û taybet rêvebirina proje û çawaniya pêk anîna wê dîtin.

## PERWERDEYÊN TEORÎ Û PİRATÎKÎ

Desteya Şaredarî û Ekolojî perwerdekirina 18 endamên ji endezyar û çavdêriya teknîkî girte ser milê xwe, ku dewreya perwerdekirina teknîkî ser 20 rojan li Akadimiya Desteya Şaredariyan li bajarê Qamişlo hate dayîn. Di dewrê de mijarên wekî (sîstema desturname, sîstema peyman û rêvebirin, Plan û Statîstîk anjî serjimêrî, Ji bo alavên bikaranîna avahiyan tecrûbeyên labowartor, Karên lêkolîn (Tebo cografî û şrovekirina bernameya Eletokad (Rektoriya Endezyarî) û Lêkolîn û pêkanîna projeyên wekî av û rê hate dayîn.
Her wiha di perwerdê ser rêbazê projeya 2018’e piranî hete şirovekirin, her wiha çawaniya kêm kirina mîna van kêmasiyan û ser xistina projeyên xizmetguzarî hate nîqaşkikrin. Di heman demê de ev dewreya tenî di milê teorî de nema, Da ku endma di milê piratîkî de jî bibînin çûne ser pira ku di keve ser riya Ceza ya girêdayî Til Hemîs dîtin.” *Ronahî/Qamişlo*



## RAMANÊ RÊBERTIYÊ



### Hevjiyana Azad -11-

**Abdulah Ocalan**

Ji bo mêrekî li pey hevjiyana azad diçe, xusûsên berê pêşî divê pêk bîne mirov dikare xulase weha bîne ziman:
a- Ev mêr jina derkeve pêşberî wî, divê baş zanibe ku di bin şaristaniya pênc hezar salî û hegemonya wê ya kapîtalîst a pênc sed salî de li her cure şertên koletiyê hatiye gerandin. Çareyeke bi tenê ya vê jinê heye, li hemberî mêrê bûye piling bibe mêpiling. Stratejî û kêlî bi kêlî taktîkên jiyana wê bi tevahî li ser vî bingehî hatine avakirin. Eger em mijarê berevajî bixwînin, ew jî li gorî xwe xwediyê qefesekê ye, li hevalmêrekî digere ji bo bixe hundirê wê. Eger mêr li pey hevjiyaneke azad be, rizgarbûna ji stratejî û taktîkên jineke bi vî rengî herî kêm bi qasî yên jina kole zor in. Jineke bi vî rengî, bi stratejî û taktîkên xwe koletiyê ferz dike, lewma mêrekî sosyalîst ê li pey hevjiyaneke azad berê pêşî divê li vê qadê têbikoşe û heta li vê qadê bi ser nekeve nikare ji bo têkoşîna civaka sosyalîst gavê biavêje.
b- Mêrekî ji bo zewacê givrokî bûbe, divê zanibe ku herî kêm bi qasî jinê ketiye bin bandora saziya koletiyê. Ji bo ev mêr ji bandorên wê yên neyênî bibihure divê di mekanê malê de timî li pey jiyana sosyalîst bibeze. Bi jina kole re jiyan bi koletî dibe, çewt dibe. Ji bo mirov karibe ji çanda mala giştî (kerxaneyê) ya taybetî bûye bibihure, divê mirov karibe bibe xwediyê çanda hevjiyana azad.
c- Li dijî çanda cinsiyetparêz a moderniteya kapîtalîst ku mirovan ji rê derdixe, divê mirov timî û bi awayekî serketî bi nefsa xwe re şer bike. Stratejî û taktîkên ji bo teslîmgirtina mêr hatine pêşxistin herî kêm bi qasî êsîrtiya jinê, mêr diqedînin. Divê mirov ji bîr neke ku di moderniteya kapîtalîst de mêr ji aliyekî ve bi tenê weke mêrtiya biyolojîk hatiye nepixandin û zêde mezinkirin, li aliyê din jî ew bi tevahiya çanda wî ya civakî kirine jinkok û pîrek. Mêrê biyolojîk ê zêde cinsiyetparêz ji aliyekî ve dikin piling, li aliyê din jî bi çanda jinkokiyê (jina kolebûyî) wî dikin mîna pisîkekê. Heta ku ev mêrtiya modernîte ferz dike neyê hilweşandin, mirov nikare bibe sosyalîst û nikare ji bo civaka sosyalîst têbikoşe.
d- Tevî van hêmanên neyênî gişan jî ji bo hevjiyana azad herî kêm bi qasî têkoşîna jina azad têkoşîna mêrê azad jî divê. Ji bo mêrek azad bibe, divê mirov karibe ji kesayeta mêrê ku civaka mêrê serwer ew kiriye kole, bibihure. Di rastiya me ya civakî de hê jî ariftî heye û divê mirov karibe xwe bigihîne wê mertebeyê. “Mirov weke mêr ji diya xwe nabe, mirov paşê dibe mêr” di çarçoveya vê gotinê de mirov dikare bibêje, mirov weke mêrê şaristaniyê bê dinê jî mirov dikare bibe mêrê azad. Forma mêrtiya Prometheûsî di serdema me de mirov bi tenê dikare bi zanist, felsefe û hunerê moderniteya demokratîk berbiçav bike. Divê mirov bi girîngî fêhm bike ku mîtolojî, dîn, felsefe, zanist û huner ji bo jiyanê ne, û rola wan a sereke pêkanîna hevserî û hevaltiya azad e, û di vê çarçoveyê de divê mirov wan exlaqî û estetîk bike. Zewacên hemdem ên heyî dewama çanda xanedaniya hiyarerşîk in. Ev çand bi qasî heft hezar salan temenê xwe heye. Li qada vê çandê nirxên bingehîn ên civaka dewletdar têne çêkirin û destavêtinê weke norm û namûsê bi kesayetên mêr û jin didin qebûlkirin. Ji ber ku ev çanda destavêtinê ya bi armanca desthilatdarî û mêtinkariyê li kesayetan bar dikin, eşq pêk nayê, gelek jin û mêr hevdu ber didin û malbat ji hev belav dibin. Li dijî vê çanda destavêtinê, mirov dikare civaka sosyalîst û azad, bi kesayetên kêlî bi kêlî bi felsefe, zanist, etîk û estetîkê têne barkirin, pêk bîne. Eşkere ye ku hevjiyana azad a li ser vî bingehî çêbibe, wê her tim ji bo ferd û civakê rê li ber xweşikî, rastî û qenciyê veke.



# Jinên Kobanê name ji CPT re şandin

**Bi boneya 25’ê Mijdarê Roja Tekoşîna Li Dijî Tundiya li ser Jinan, jinên Kobanê li gundê Elperlûr yê ku Rêber Ocalan di sala 1979’an lê mabû semînerek lidarxistin. Di semînerê de bi dehan jin amade bûn. Piştî semînerê jinan ji bo tecrîda li ser Rêber Ocalan bi dawî bibe ji CPT’yê re nameyek şandin.**

Bi boneya 25’ê Mijdarê Roja Tekoşîna Li Dijî Tundiya li ser Jinan, jinên Kobanê çalakiyên xwe didomînin. Bi vê armancê li gundê Elpelûr ê Kobanê bi pêşengtiya Rêxistina Sara û Kongreya Star semînerek hate li darxistin. Piştî semînerê jinan ji bo bidawîkirina tecrîda li ser rêber Ocalan name ji CPT re şandin.
Bi nêzîkbûna 25ê Mijdarê jinan çalakiyên xwe zêde kirin.
Li Kobanê li gundê Elpelûr ê ku rêber Ocalan di sala 1979’an de lê mabû, jinan semînerek lidar xist.
Di semînerê de bi dehan jin amade bûn.
Mijarên semînerê şîdeta li ser jinan bû û bal kişandin ser xebatên rêber Ocalan ên ji bo azadiya jinan.
Di semînerê de Endama Rêveberiya Kongra Star Çarçêla Zeydan



axivî. Çarçêla bal kişan ser wate û girîngiya tekoşîna 25`ê Mijdarê û wiha got: “Meha Mijdarê di tekoşîna me de û tekoşîna azadiya jinê de meheke tije berxwedanî ye. Di vê tekoşînê de yê ku çavê jinên Kurd vekiriye bê guman rêber APO ye. Lewma pêwîst e em wetaya vê tekoşînê û dîroka wê baş zanibin. Me îro dest bi hemleya çalakiyên ji bo 25`ê Mijdarê kiriye. Armanca hemleya me ya sereke azadiya rêber APO ye.”
Çarçela Zeydan, diyar kir ku dema rêbertî dest bi şoreşa rizgarkirina jinê kiriye, ev gav tenê ne jibo jinên Kurd bû, ji bo jinên cîhanê tevahî bû.
Çarçela wiha dewam kir: “Bi hezaran jinên ku bi salan bin dest bûn, jiyana wan tarî bû, rêber APO weke çiruskekê şewq da û jiyana me ronî kir. Li ser vê riyê bi hezaran jin meşiyane û bi hezaran jî weke Zîlan, Bêrîtan û Arînan canê xwe fedayî walatê xwe û azadiya jinan kirine.”
Piştî axafina Çarçela Zeydan jinan name ji bo CPT nivîsandin û ji CPT xwestin ku dawî li tecrîda li ser Rêber Ocalan bîne û azadiya wî misoger bike…*ANHA*

# Li Reqayê çalakiyên 25’ê Mijdarê tên lidarxistin

Rêveberiya Jin a Reqayê rêze çalakiyên xwe yên bi boneya Roja Têkoşîna li Dijî Tundiya li ser Jinan didomîne.
Bi boneya nêzîkbûna Roja Têkoşîna li Dijî Tundiya li ser Jinan Rêveberiya Jin a Reqayê rêzeçalakiyan lidardixe.
Rêveberiyê herî dawî li devera Xinêzat a bakurê bajarê Reqayê semînerek lidar xist. Di semînerê de bi dehan jin, endamên meclîs û malên jin beşdar bûn.
Semîner ji aliyê endamên Rêveberiya Jin Suad El-Kurdî û Sewsen El-Xelef hate birêvebirin û têde rêbaz û şêwazên tundiyên li dijî jinan hate şîrovekirin.
Di semînerê de behsa serdema dagirkeriya çeteyên DAIŞ’ê û hovîtiya wan li ser jinan hate kirin. Her wiha hate gotin ku piştî salekê ji rizgarkirina bajêr jinan gavên mezin ber bi azadiya xwe ve avêtin.
Semîner bi nîqaşên di navbera beşdaran de yên girêdayî rêbazên têkoşîna li dijî tundiya li ser jinan bi dawî bû.




Derbarê girîngiya Roja Têkoşîna li Dijî Tundiya li ser Jinan a Cîhanê de hevseroka buroya Perwerdehiyê ya Reqa Meyade Îbrahîm El-Şêx axivî û wiha got: “Divê jin xwe rizgar bikin û li dijî tundiyê têbikoşe.” Meyade da zanîn ku ev çalakî dihêlin ku jin maf û erkên xwe nas bikin.
Di çarçoveya çalakiyan de jinan belavokên pênasekirina têkoşîna li dijî tundiya li ser jinan û rêbazên berxwedana li dijî wê li kolanên bajêr belav kirin…*ANHA*



# Kongreya Star rêzeçalakî pêk anî



Li Heleb, Dêrik û Şamê têkildarî 25’ê Mijdarê Roja Têkoşîna li dijî Tundiya li Ser Jinê ya Cîhanê di pêşengiya Kongreya Star de li gelek deverên Rojava û Sûriyê rêze çalakî hatin kirin.
Bi minasebeta 25’ê Mijdarê Roja Têkoşîna li Dijî Tundiya li Ser Jinê di pêşengiya Kongreya Star û gelek rêxistinên din ên jinan de li gelek deverên Rojava û Sûriyê rêze civîn û semîner hatin kirin û tundiya li ser jinê hat şermezarkirin.

## HELEB

Kongreya Star a taxa Şêxmeqsûd civînek li dar xist. Di civînê de endamên saziyên sivîl û partiyên siyasî amade bûn. Di civînê de endama rêveber a Kongreya Star Nehla Mistefa perspektîfên Rêber Ocalan ên têkildarî rola jinan bi Erebî û Kurdî hatin xwend.
Herwiha di civînê de senevizyonek jî li ser dîroka jinê û berxwedana wê hate nîşandan

## DÊRIK

Kongreya Star bi heman armancê du civînên cuda li gundên Robarya û Bana Qesrî yên girêdayî bajarê Dêrikê li dar xistin.
Bi dehan jin beşdarî her du civînan bûn. Endama rêveber a Kongreya Star a Herêma Cizîrê Henîfe Mihemed axivî û dîroka roja 25‘ê Mijdarê vegot. Henîfeyê wiha got: “Ger ku jin azad nebe wê koletî berdewam bike. Azadiya jinan û wekhevîkrina wan, asta civakê diyar dike. Heta niha rol û cihê jinan ê rast di zanistek civakî de nehatiye xuyakirin. Şoreşa Jinan, şoreşa herî bi hêz e. Jinan di şoreşê de xwe bi rêxistin kir û di hemû waran de xwe isbat kir.”

## TIL HEMÎS

Her wiha li navçeya Til Hemîsê jî Kongreya Star bi dirûşma “Bi vîna jina azad em ê dagirkeriyê bişkînin” du civînên cuda li bajarokê Til Ehmed û Ebû Cern lidarxist. Di her du civînan de berdevka Meclisa Jinan a Sûriyê ya Kantona Qamişlo Hêva Mehmûd axivî û tundiya li ser jinan vegot.
Ji aliyê din ve Kongreya Star û Koordînasyona Jinan a Rêbevberiya Xweseriya Demokratîk bi heman armancê semînerek li navenda Mihemed Şêxo ya Çand û Hunerê ya bajarê Qamişlo lidarxist.
Bi dehan jinên Qamişlo beşdarî semînerê bûn. Di semînerê de têkildarî 25’ê Mijdarê de belavok li beşdaran hatin belavkirin. Piştre berdevka Komîteya Civakî Gulistan Elî rola jinê di civakê de bi bîr xist. Gulistan wiha got: “li tevahiya cîhanê ji bo wekheviya di navera jin û mêr de divê têkoşîneke xurt bê dayîn.”

## ŞAM

Têkildarî 25’ê Mijadarê Kongreya Star li taxa Zorava ya Şamê civînek li dar xist. Di civînê de bi dehan şêniyên taxê û endamên saziyên sivîl amade bûn. Di civînê de, dîroka jinê, cûreyên tundiya li ser jinan û bandora wê ya neyinî li ser civakê, her wiha rêbazên rêgirtina li ber tundiyê hatin nîqaşkirin…*ANHA*

# Tundiya li ser jinê tundiya li ser civakê ye



Hevseroka Kantona Hesekê Civîn Remo bi boneya 25’ê Mijdarê Roja Têkoşîna li Dijî Şideta li ser Jinan ya Cîhanê anî ziman ku ew ê asta têkoşînê bilindtir bikin.
Hevseroka Kantona Hesekê Civîn Remo da zanîn ku jin bi vîn û îradeya xwe ya azad dikarin rê li şîdeta li ser jinan bigirin û bang li jinan ki di 25’ê Mijdarê hemû hêza xwe bikin yek û ji tundiya li ser jinê re bibêjin êdî bes e.
Civînê di dewama axftina xwede diyar kir ku jin di xwezaya xwe de pêşeng e û wiha got: “Çiqas jin hêza xwe nas bike ewqasî ew ê bi bandor be û rolek pir mezin di avakirina civakê û bîngehek pir xurt di pirojeya Netewa Demokrat de bide rûnştandin. Ji ber wê jî hemû êrîş bi taybetî li ser jinê tên kirin û bi vê tê armanckirin ku îradeya jinê bê şikandin. “
Civînê bal kişand ser rola jinê ya di civakê de û wiha dewam kir: “Heta ku jin ne azad be mirov nikare bahsa civakeke azad biike. Ji ber ku bingeha civakên azad jinek azad e. Tundiya ku li ser jinan tê meşandin bi armanca têkbirina wê civakê tê kirin. .Şoreşa Rojava ya ku bi pêşengtiya jinê geş bû, rê li ber tundiya li ser jinê girt û heta roja îro jî ev berxwedan berdewam dike. “
Hevseroka Kantona Hesekê Civîn Remop di dawiya axftina xwede bang li hemû jinan kir ku asta têkoşînê bilndtir bikin, 25’ê Mijdrê dakevin qadan û ji tundiya li ser jinê re bibêjin na…*JINNEWS*

# Divê têkoşîna sosyalîzmê bê mezinkirin

**Endamê Komîteya Rêveber ya PKK'ê Nûreddîn Demîrtaş, bi wesîleya salvegera 40. a damezrandina PKK'ê diyar kir ku, PKK bûye ala sosyalîzmê. Demîrtaş diyar kir PKK ji bo Kurdan, Tirkan, Suryaniyan, Ereban, Çerkesan û hemû gel û baweriyên li ser xaka qedîm a Mezopotamyayê ne, bûye tevgera azadî û demokrasiyê. Demîrtaş, li dijî faşîzmê banga mezinkirina têkoşîna sosyalîzmê kir.**



Endamê Komîteya Rêveber ya PKK'ê Nûreddîn Demîrtaş, bi wesîleya salvegera 40. a damezrandina PKK'ê diyar kir ku, PKK bûye ala sosyalîzmê. Demîrtaş, li dijî faşîzmê banga mezinkirina têkoşîna sosyalîzmê kir.
Demîrtaş salvegera 40. a damezrandina PKK'ê li Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan, gerîlayên azadiyê yên Kurdistanê, gelê Kurd û hemû gelên bindest pîroz kir. Endamê Komîteya Rêveber a PKK'ê Nûreddîn Demîrtaş, bi wesîleya salvegera 40. a damezrandina PKK'ê ji ANF'ê re axivî.

## PKK'Ê RÊ LI BER SERFIRAZIYÊ VEKIR

Demîrtaş diyar kir, PKK ji bo Kurdan, Tirkan, Suryaniyan, Ereban, Çerkesan û hemû gel û baweriyên li ser xaka qedîm a Mezopotamyayê ne, bûye tevgera azadî û demokrasiyê.
Nûreddîn Demîrtaş diyar kir, PKK ji gelên bindest û baweriyan re bûye berxwedan, serketin û hêviya serfiraziyê û anî ziman, gelên ku hêz û îlham ji PKK'ê girtine, bûne xwedî derfetên afirandina jiyana azad û wekhev.

## PKK MEJIYEKE KU TÊK NAÇE

Demîrtaş ragihand, gelan li ser vê bingehê li dijî moderNîteya kapîtalîst sîstemeke alternatîf afirandine û wiha dewam kir, "PKK'ê xwe bi wijdan, lehengî û wêrekiyê xemilandiye. PKK mejiyek e ku serî natewîne û têk naçe. Ev mejî di heman demê de çareyê diafirîne."
Demîrtaş destnîşan kir, şert û merc çi dibin bila bibin, PKK timî çareyan diafirîne û got, "PKK ji ber ku xwedî cewhereke sosyalîst e, bi vî rengî ye. Gelên cîhanê êdî bi vê rastiyê hesiyane."

## PKK BÛYE ALA SOSYALÎZMÊ

Endamê Komîteya Rêveber ya PKK'ê Demîrtaş da zanîn ku emperyalîzm, kapîtalîzma global çiqasî hewl didin PKK'ê krîmînalîze bikin bila bikin, êrîşên xwe yên komployê bila bidomînin PKK êdî tevgereke azadiyê ye ku li ser zimanê gelên cîhanê ye.
Demîrtaş diyar kir, PKK êdî bûye ala sosyalîzmê ku di destê gelan de ye û got, "Lewma PKK tevgereke ku ispat kiriye ew têk naçe."

## BANGA JI BO AZADKIRINA KURDISTANÊ

Demîrtaş diyar kir li gel hêviya ku daye mirovahiyê, PKK bi şîrove û pêngavên xwe yên nû yên li ser sosyalîzmê, bûye pêşengê Sosyalîzma Zanistî Demokratîk û wiha dewam kir: "Têkoşîna sosyalîzmê bûye têkoşîneke mirovahiyê. Mîna ku Rêber Apo dibêje, 'israra di sosyalîzmê de, israr di mirovbûnê de ye'. Em pê bawer in ku li ser xeta PKK'ê û Rêbertî, di bin ala Sosyalîzmê de em ê teqez bi ser bikevin.
Bi vê wesîleyê ez careke din salvegera 40. a damezrandina PKK'ê li hemû hêzên çep, sosyalîst, anarşîst, demokratîk, femÎnîst, jin, ciwan, her kesên dixwazin têbikoşin û tevahiya mirovahiya ku berxwedan, hêvî, rizgarî, azadî û serketinê di nava Sosyalîzmê de dibînin, pîroz dikim. Û bang li her kesî dikim ku PKK'ê, cewhera wê ya Sosyalîst, civakîbûna wê, cewhera wê ya demokratîk ji nêz ve nas bikin, bi xurtî lêkolîn bikin. Bi taybetî, ji bo tecrîdkirina Rêber Apo bê rakirin, faşîzm were hilweşandin û Kurdistan azad bibe, bang dikim."

## DÎKTATORIYA ERDOGAN-BAHÇELÎ WÊ HILWEŞE!

Nûreddîn Demîrtaş diyar kir, xeta neteweya demokratîk a Ocalan, wê di Şerê Sêyemîn ê Cîhanê de çarenûsa Rojhilata Navîn û cîhanê biguherîne û işaret bi hewldanên komploya navneteweyî yên li dijî vê xetê kir.
Demîrtaş nerazîbûna xurt û îradeya gelan a li dijî van hewldanan bi rêzdarî silav kir û got, "Gerîlayên azadiyê yên Kurdistanê wê her tim parêzvanên serketî yên gelan bin. Li dijî hemû feraset, zîhniyet û kesên xwîna mirovahiyê dimêjin, PKK'ê hêza xwe û çandeke nû ya ku xwe dispêre gelê xwe afirandin. Bi pêşengiya jin û ciwanan, bi têkoşîna Sosyalîzmê, bi têkoşîna mirovahiyê wê faşîzm teqez bê hilweşandin. Faşîzm ti carî mayînde nebûye. Ti ji dîktatoriyên faşîst navê xwe li dîrokê nenivîsîne. Em dibînin ku dîktatoriyên nû derdikevin holê. Ti ferqa dîktatoriya faşîst a Erdogan-Bahçelî ji vê yekê nîne. Divê dîktatoriya faşîst a Erdogan-Bahçelî baş bi vê zanibin; wê di nava rûpelên tarî yên dîrokê de cih bigire û nikaribe xwe ji hilweşandinê rizgar bike."
Demîrtaş got, "Gelên me wê bibînin ku dîktatoriya Erdogan-Bahçelî têk diçe."
Nûreddîn Demîrtaş di dawiya axaftina xwe de bang li ciwanan kir ku ji bo mezinkirina têkoşîna sosyalîzmê û hilweşandina faşîzmê tevlî nava refên azadiyê bibin.

# Em amade ne bersiva êrîşan bidin

Ebdulezîz El-Cerba êrîşên artêşa Tirk a dagirker yên li ser Bakurê Sûriyê şermezar kir û destnîşan kir ku divê êlên herêmê têkiliyên xwe bi rêveberiya xweser û QSD'ê re xurt bikin.
Şêxê êla El-Şemer a Iraqê Şêx Ebdulezîz El-Cerba piştî êrîşên DAIŞ'ê li dijî Iraqê, hate Sûriyê û niha li Bakurê Sûriyê dimîne.
Şêxê êla El-Şemer Ebdulezîz El-Cerba derbarê rewşa Bakurê Sûriyê û êrîşên artêşa Tirk a dagirker li dijî herêmên Bakurê Sûriyê de axivî û ji bo pêşwazîkirina koçberên Iraqî spasiya Rêveberiya Xweser kir û El Cerba wiha got: "Rêveberiya Xweseriya Demokratîk tevî şênî û êlên herêmê penaberên Iraqê yên ku ji ber hovîtiya çeteyên DAIŞ'ê ji welatê xwe neçar man derkevin, pêşwazî kirin."
Şêx Ebdulezîz destnîşan kir ku projeya rêveberiya xweser projeyeke niştîmanî ye û dikare hemû pirsgirêkên Sûriye û hemû welatên herêmê çareser bike û wiha dewam kir: "Rewşa Iraqê mîna ya Sûriyê ye. Ez bi hêvî me ku hikumeta Iraqê vê tecrubeya tekane wek nimûneya çareserkirina hemû pirsgirêkên Iraqê lê xwedî derkeve. Tecrubeya rêveberiya xweser hemû pirsgirêkên Bakurê Sûriyê çareser kirin û dikare bibe çareseriya aloziya Sûriyê. Ji ber wê divê ev proje di nav sînorên Sûriyê de nemîne."
El-Cerba destnîşan kir ku tecrubeya rêveberiya xweser; ji bo çareseriya aloziyan têkiliyên siyasî û civakî yê di navbera gelan de a herî rast e.
Şêx Ebdulezîz El-Cerba têkildarî têkiliyên di navbera QSD'ê û êlên herêmê de wiha got: "Dema pirsgirêkek derkeve, bi rêya danûstandinê em wê çareser dikin. Ji ber wê divê ev têkilî werin xurtkirin. Divê hemû êl li derdora Rêveberiya xweser kom bibin, ji ber ku mafên wan digire bin mîsogeriyê."
Ebdulezîz El-Cerba di dirêjahiya gotinên xwe de êrîşên artêşa Tirk a dagirker li dijî herêmên Bakurê Sûriyê şermezar kirin û wiha dewam kir: "Ez van êrîşan bi tundî şermezar dikim. Tu hincetên van êrîşan tune ne." El-Cerba bi van gotinan bang li serokê rêjîma Tirk Erdogan kir: "Gelo ewlehiya herêmê û hevgirtina civakê li we xweş neht? Ez tenê gotinekê ji te re dibêjim, Bakurê Sûriyê herêmeke ewle ye Erdogan, jê dûr bikeve."
Di dawiya axaftina xwe de şêxê êla El-Şemer ê Iraqê Ebdulezîz El-Cerba wiha got: "Em îro li ser vê xakê dijîn. Me ji xêr û bereketa wê xwariye. Em amade ne tevî gelên herêmê li hember êrîşan bisekinin."...*ANHA*



## Hawara Leyla Guven



Tayîp TEMEL

Siyasetmedara kurd, wekîla HDP'ê ya Colemêrgê Leyla Guven dest bi greva birçîbûnê kir. Biryara birêz Guven, nîşaneya qonaxeke xeternak e. Di dîrokê de hin neden hene ku peyv û guftûgo bêwate dimînin. Nîqaş û şîrove êdî bandora xwe wenda dikin. Di warê ravekirina îradeyê de, rola helwestê derdikeve pêş. Tecrîda li ser birêz Abdullah Ocalan işaretê bi tecrîdkirina îradeya gelê kurd dike. Leyla Guven dixwaze ku tecrîda li ser birêz Ocalan rabe û Serokatî azad bibe. Lewre ew, lîderê Tevgera Azadiya Kurdistanê ye û bi dehan caran li ser navê vê tevgerê bi nûnerên dewletê re hevdîtin kirine. Lê tê zanîn ku ji 27'ê tîrmeha 2011'an de, brêz Ocalan di bin tecrîda giran de ye û hevdîtina wî ya bi parêzeran re tê astengkirin.

Leyla Guven hem hevseroka Kongreya Civaka Demokratîk e, hem jî parlamentera HDP'ê ye û dizane ku pêwendiya dîlgirtina wê, bi tecrîda li ser birêz Ocalan re heye. Leyla Guven di warê temsîliyeta îradeya gelê kurd de, cihekî giring digire. Ligel vê jî di rewşeke dîlgirtî de, li Girtîgeha Amedê Tîpa E'yê tê ragirtin.

Tecrîda li ser Abdullah Ocalan, nayê qebûlkirin. Lewma wekîla Colemêrgê û hevseroka Kongreya Civaka Demokratîk birêz Leyla Guven di 8'ê mijdarê de li Girtîgeha Amedê dest bi greva birçîbûnê kir. Tecrîda ku li ser birêz Ocalan tê meşandin; li dijî îradeya gelê kurd wekî êrîşeke dijwar, xeternak û tehekumker bi nav dike. Wateya dîlgirtin û tecrîdkirina Serokatiyê, dîlgirtin û tecrîdkirina tevahiya gelê kurd e. Kurd, ev êrîşa rûreş û dermirovî qebûl nakin.

Birêz Leyla Guven jî, berdevka îradeya gelê kurd e, di biryara xwe de mafdar e û ji gel piştgiriyê werdigire. Lewma bi armanca piştgirîdayîna çalakiya greva biçîbûnê ya Leyla Guvenê, di 17'ê mijdarê de li 5 navendan greva biçîbûnê berbelav bû. Çalakiya grevê bi beşdariya parlamenter, endam, rêveber û dildarên HDP, DBP, TJA û KCD'ê ji bo 2 rojan li Amed, Edene, Colemêrg , Riha û Wanê dest pê kir. Ger pêvajo bi vî rengî bidome, tê payîn ku çalakiyên piştgirî û piştevaniyê gurtir bibin.

Tirkiye di nav krîzeke piralî de ye. Lê ji dêvla ku pirsgirêkên xwe bi rêbazên aştiyane û demokratîk çareser bike, her ku diçe bêtir bi ber rewşeke faşîzan ve digindire. Bi rêbazên sivîl û siyasî li çareseriya pirsgirêkan nagere, ji bo têkbirin, eciqandin û pelixandina îradeya gel û civakên herêmê têdikoşe. Di vê serdemê de jî hewl dide ku krîza binyadî bi êrîşkarî û şerkariyê manîpule bike, bi tundî û tûjiyê dînamîkên civakê bêdeng bixe û bi vî awayî tengava aboriyê derbas bike. Lewma roj bi roj li dijî îradeya gelê kurd, êrîşên dijwartir diceribîne. Serokatiyê tecrîd dike, siyasetmedaran û wekîlan rehîn digire, wekîltî û mafê destlênedana wekîlên kurd betal dike, herwiha bi konseptên otorîter û totalîter dajo ser kurd û kurdistaniyan.

Encax gelê kurd rêya berxwedanê naterikîne. Piştî ewqasî pêşveçûn û serkeftin, gelê kurd êdî doza azadî û demokrasiyê bernade. Jixwe di israr û biryardariya Leyla Guvenan de jî diyar dibe ku heta mafên xwe yên rewa bi dest nexe, gelê kurd ji ser dika berxwedanê danakeve. Desthilatdariya Tirkiyeyê jî û dagirkeriya Rojhilata Navîn jî divê vê heqîqetê ji bîr nekin. Leyla Guven ne bi tenê ye, di navenda bîr û bala gelê kurd de ye. Daxwazên birêz Guven daxwazên me ne, helwesta wê helwesta me ye û em ligel wê ne.

Di rêya azadî û demokrasiyê de, gelê kurd li dijî faşîzma 12'ê Îlonê jî çalakiya greva birçîbûnê pêk anîbû û faşîzm têk biribû. Ger îro gelê kurd ji nû ve pêdiviyê bi çalakiya greva birçîbûnê dibîne, têkçûna faşîzma îro jî ne dûr e.



# Xwezaya Efrînê tê talankirin

**Talan, kuştin, revandin, êşkence, dizî, guhertina demografîk û bi her awayî qirkirin li Efrînê dewam dike. Dewleta Tirk û çeteyên xwe li ber çavên hemû cîhanê van sûcên mirovahiyê dikin. Dewleta Tirk li cem hemû van kiryaran xwezaya Efrînê jî tune dike. Dagirker darên zeytûnan jê dikin û bi dozeran ji binîve radikin.**



Dagirkeriya dewleta Tirk a li Efrînê ne tenê gefê li jiyan û mafên mirovan dixwe. Her wiha metirsiyeke li ser xwezayê. Zeytûn tên dizîn, tên talankirin û dar bi dozeran ji kokê ve tên rakirin.
Piştî ku dewleta Tirk 20'ê Çileyê li Efrînê dest bi êrîşan kir û 18'ê Adarê jî dagir kir, ji hingî ve li herêmê bi rêk û pêk sûcên li dijî mirovahiyê tên kirin.
Dewleta Tirk a dagirker û çeteyên wê terorê li ser welatiyên herêmê dikin. Bi rêya malbatên çeteyan ên ji deverên din anîne, demografiya herêmê diguherînin, dest datînin ser mal û milkên gelê xwecihî, sivîlan direvînin, êşkenceyê li wan dikin û înfaz dikin.
Rêxistina Efûyê ya Navneteweyî û Rêxistina Şopandina Mafên Mirovan (HRW) di raporên xwe de yên nava salê weşandin, bal kişandin ser van sûcên şer.
Êrîşên rejîma Tirk a dagirker ne tenê li dijî sivîlan û binesaziya cih û warê sivîlan e. Di heman demê de êrîş li çavkaniyên debarê yên şêniyên herêmê û xwezaya herêmê tên kirin.
Bi taybetî, zeytûnên Efrînê tên talankirin ku yek ji çavkaniyên bingehîn ên debarê ye. Darên zeytûnan tên birrîn û zeytûnên wê jî tên dzîn.
Beriya niha bi demeke kin eşkere bûbû ku rejîma dewleta Tirk bi çeteyan re li hev kiriye û plan kiriye ku dewlemendiyên herêmê li welatên herêmê û welatên Ewropayê bifiroşin.
Herî dawî çavkaniyekî ji Efrînê bi rêya telefonê dîmen kişand û şand. Di vî dîmenî de tê dîtin bê darên herêmê çawa tên rakirin û talankirin.
Cihê ku tê talankirin, herêma Maseka ya navçeya Raco ye. Darên zeytûnê bi rêya dozeran ji binî ve tên rakirin.

# Em ê piştgiriyê bidin QSD`ê



Rûspiyên êlan ên kantona Qamişlo diyar kirin ku ew ê li hember êrîşên artêşa Tirk a dagirker û çeteyên wê li ser herêmên Bakurê Sûriyê bê deng nemînin û dan zanîn ew ê heta dawiyê piştgiriyê bidin QSD`ê.
Bi dehan rûspiyên êlên kantona Qamişlo tev li hevdîtina ku di 17'ê mehê de li Qamişlo hate lidarxistin, bûn. Hevdîtin bi pêşengiya Buroya Têkiliyên Giştî ya Hêzên Sûriya Demokratîk (QSD) hate lidarxistin. Rûspiyên ku tev li hevdîtinê bûbûn, derbarê êrîşên artêşa Tirk a dagirker li ser herêmên Bakurê Sûriyê de axivîn.
Rûspiyê êla Şerabiyan ê bi navê Sbit El-Cewher destnîşan kir ku hemû rûspiyên herêmê li dijî êrîşên artêşa Tirk a dagirker yên li ser herêmên Bakurê Sûriyê yekitiya xwe ava kirine. El-Cewher diyar kir ku dema ku çeteyên DAIŞ`ê li hember hêza şervanên QSD`ê ber bi tunebûnê ve diçin, artêşa Tirk a dagirker êrîşî herêmên Bakurê Sûriyê kir, armanca Erdogan ew e ku bi êrîşên li ser herêmê aramî û ewlehiya herêmê têk bibe.
El-Cewher destnîşan kir ku ew tu carî li hember êrîşên artêşa Tirk a dagirker û çeteyên wê bê deng namînin. Di dawiyê de Sabit El-Cewher diyar kir ew ê heta dawiyê piştgiriyê bidin şervanên QSD`ê ku ji bo bidawîkirina êrîşên artêşa Tirk a dagirker li ser herêmên wan hatine avakirin û da zanîn divê hemû pêkhateyên Bakurê Sûriyê li dijî êrîşên artêşa Tirk a dagirker û çeteyên wê derkevin.
Rûspiyê êla El-Hebîb Îsam El-Hebîb jî êrîşên artêşa Tirk a dagirker ên li ser herêmên Bakurê Sûriyê şermezar kir û destnîşan kir ku armanca wan ew e ku tevliheviyê di navbera pêkhateyên herêmê Kurd, Ereb û Suryaniyan de derxin.
El-Hebîb diyar kir ku divê hemû li dijî hemû êrîşan yekitiya xwe ava bikin û destnîşan kir ku dê destekê bidin şervanên ku di çeperên şer de parastina ax û rûmetê dikin û divê hemû êlên herêmê ji bo parastina Sûriyê zarokên xwe tev li refên QSD`ê bikin...*ANHA*

# Tecrîd wê bi têkoşînê bi dawî bibe

Siyasetmedarên ji bo destekê bidin çalakiya greva birçîbûnê ya Hevseroka KCD'ê Leyla Guven ku ji bo dawî li tecrîda li Îmraliyê bê dest bi greva birçîbûnê kirin, diyar kirin ku hêviya gelên Rojhilata Navîn Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan e û gotin: "Tecrîd wê bi têkoşînê bi dawî bibe."
Komîsyona Rêxistinbûyînê ya Navendî ya HDP'ê, ji bo piştgiriyê bide Hevseroka Kongreya Civaka Demokratîk Leyla Guven ku ji bo tecrîda li ser Rêber Ocalan rabe dest bi greva birçîbûnê kiriye, li 5 bajaran ji bo 2 rojan çalakiya greva birçîbûnê da destpêkirin. Siyasetmedarên tev li çalakiya greva birçîbûnê bûn, ji bo dawîlêanîna tecrîdkirina Rêber Ocalan bang kirin.

## 'GELÊ KURD TÊ TECRÎDKIRIN'

Hevserokê DBP ya Rezanê Mehmet Alî Alkan, diyar kir ku 3 sal in hevdîtin bi Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan re çênabin û bi awayekî giran tê tecrîdkirin. Bi tecrîdkirina Birêz Ocalan gelê kurd bi tevahî tê tecrîdkirin."
Alkan got: "Gelê kurd bi Birêz Ocalan bêhnê distîne û dijî. Ji roja hatiye girtin heta niha tê tecrdîkirin û di 3 salên dawî de jî di nav tecrîdê de tê tecrîdkirin. Wexta rêberê gelekî bê tecrîdkirin ew gelê bê tî û birçî ye. Ev tenê bi gelê kurd ne sînrodarkirî ye. Ger tecrîdkirina Ocalan dewam nekirina, wê îro li Rojhilata Navîn ev şer tune bûna. Birêz Ocalan hêviya gelan e. Gel dixwaze demildest dawî li vê tecrîdê bê."
Alkan, anî ziman ku wê tecrîd bi têkoşîna hevpar a gelê kurd bi dawî bibe û ev yek jî bi yekîtiya netewî pêkan e.

## RÊBERÊ ROJHILATA NAVÎN E

Hatûn Aslan ku tev li çalakiya greva birçîbûnê bû, bal kişand bêhiqûqîtiya li Ocalan tê kirin û got: "Birêz Ocalan tenê ne rêberê gelê kurd, rêberê gelên Rojhilata Navîn e jî." Aslan, anî ziman ku ew destekê didin çalakiya Hevseroka KCD'ê Leyla Guvenê û got: "Êdî em ê qebûl nekin. Bi vê tecrîdê gelê kurd jî tê tecrîdkirin û her diçe kûrtir dibe."



## EM DEYNDARÊ OCALAN IN

Hevserokê HDP'a Navçeya Rezanê Necmeddîn Bûrakmak, destnîşan kir ku ew deyndarê Birêz Ocalan in. Bûrakmak, diyar kir ku gelê kurd tecrîdkirina Ocalan qebûl nake û got: "Gelê me gelek caran daxuyand ku Birêz Ocalan vîna wî ya siyasî ye. Birêz Ocalan ne mirovekî ji rêzê ye. Bi fikrên xwe û paradîgmaya xwe mohra xwe li Kurdistan û Rojhilata Navîn xist. Divê îro em bi dengekî hîn bilinditr li dijî tecrîdê derkevin. Em ê tim û tim xwedî li Birêz Ocalan derkevin. Nêzîkatiye li Birêz Ocalan nêzîkatiye li gelê kurd e."
Bûrakmak bang li gelê kurd û gelên Tirkiyê kir û got: "Wê tecrîd bi têkoşînê bi dawî bibe. Heta dawî li vê tecrîdê neyê, wê gel bi ruhê 2012'an xwedî li Rêberê xwe derkeve. Em amade ne. Ev dewlet gelek caran berxwedan û têkoşîan gelê kurd pîva ye. Girêdana gelê kurd a ji bo Birêz Ocalan ji her wextê bêtir û zêdetir e. Em ê her li pêyî vê daxwaza xwe bin."...*MA*

## Hêviya ji Dîplomasiyê



Burhan ERDEM

Li rojhilata navîn van rojan pêlên dîplomasiyê di rojevê de ne. Pêl bi pêl serkeftinên dîplomasiyê jî tên jiyîn. Agirbesta Îsraîl û Hamasê herçiqasî demkî be jî, hêviyek afirandiye . Wê ev agirbest veguherîneke mezin li siyaseta hedu aliyan bike û aktorên li gorî wê bi xwe re bîne. Devereke din a ku dîplomasiyê lê hêvî afirandine Lîbya ye. Piştî şikestina DAÎŞê ya li vî welatî dor hatiye ser şerê navxweyî yê îktidarê. Li Palermoya Îtalyayê ew aliyên ji hev dikuştin di konferanseke navneteweyî de gihan hevdû.

Lê ji vana gişan mezintir, peydakirina çareseriya şerê li Sûrî, li benda cîhana dîplomasiyê ye. Li ser vê yekê jî heta biharê demek tê destnîşankirin. Ev dem ji bo kemilandina lihevkirina di navbera DYA û Rûsyayê de ye. Wê îşareta vê yekê jî di hevdîtina serokên van welatan de were dayin. Ev hevdîtin wê li zîrveya G20an a Arjantînê pêk were. Zîrveya wê du rojan bidome, di 30yê vê mehê de destpêdike.

Tehdîta vekişîna ji peymana fuzeyên balîstîk a Donald Trump û li hemberî vê destekdayina Îranê ya Vladmîr Pûtîn, ev du meh in weke mijarên guftugoya li ser nebaşbûna têkeliyên aliyan her di devan de ne. Lê ji vana zêdetir di çarçoveya Projeya Mezin a Rojhilata Navîn de, nelihevkirina aliyan heye. Ev yek di parvekirina vê erdnîgariyê de, bûyîn an jî nebûyina xwediyê bandorê ya herdu aliyan e.

Proje li astengiyan rast hat. Rabûna Gel a li dijî rejîman ku jê re Bihara Ereb hate gotin, peydabûna hêzên derketin dervî planan weke DAIŞ û yên dişibin wê û bihêzbûna Rûsyayê. Vana yek bi yek tên çareserkirin. Iraq mînaka vê çareseriyê ye ku niha rêveberiyeke dewleteke li gorî daxwazê hatiye damezrandin. Ji bo Sûrî û Îranê jî emê rêveberiyên wisa bibînin.

Li vê erdnîgariyê şer heye, lê bi giştî wêneyekî mezin ê meşandina dîplomasiyê, destpêkirina hevdîtinan li Rojhilata Navîn hakim e. Ji bo çareseriyeke li Afganîstanê hevdîtinên bi Talîbanan re heta beriya salekê nedihate bîra mirov. Lê niha li aliyekî Amerîkî, li aliyekî din Rûs, bi pêşengên Talîbanan re rûdinin. Di navbera aliyan de ku ev sê-çar nifş in pevdiçin meyla axaftina pirsgirêkan van rojan xwe ji her demê bêtir nîşan dide.
Vê meyla axaftina pirsgirêkan bi operasyona rojhilata navîn a Amerîkayê ve girêdayîye. Lewra desthilatdarên li van welatan bîhna guherînê girtine û ji bo domandina desthilatdariya xwe li çareseriya pirsgirêkan digerin. Li vêderê xwe parastineke girîng a van desthilatdaran derdikeve pêş,ku ev yek hewldaneke li hemberî guherîna îktidarên herêmê ye. Me dît ku rejîmên berê bi yekkirina hêza xwe çawa dixwazin li hemberî siyaseta guherînê ya Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê bisekinin. Lê ev sekna wan nekanî dom bike. Rûsyaya ku gava di salên nodî de ev proje eşkere bû di hesaban de tune bû - an jî ewqasî tunebû- îroj vê sekna li hemberî guherînê temsîl dike. Bi tehdîtan neyê ser rê jî, wê rêveberiya Pûtîn bi payedayinê were qanihkirin. Di demeke kurt de, mirov dikane li Washingtonê Pûtînê xelatekê digre bibîne. Heta pêşkeşkirina wî ya weke mîmarê aştiya li Sûrî.